


# Çîroka Jiyanê

## Mezopotamya

### Welatê Li Navbera Her Dû

Mebest ji welatê li navbera her du çeman rûbaran Iraqa evro û pişkek ji Kurdistanê ye. Li vê derê berî pîr ji 7000 salan yek ji kevintirîn û giringtirîn şaristaniyên mirovatîyê serîhilda. Çîroka vê şaristaniyê bi hatina cotyarên destpêkê ji bo vê deverê dest pê dike. Heta niha bi dirustî nehatî ye zanîn ka ew cotyar ji kûve hatine. Lê ne dûr e ji Kurdistanê bin ji ber ku li Kurdistan bû ku mirovan ji bo cara yekê dest bi çandinê kirî. Berî şeş hezar salan gelek li vê derê jiyaye ku dîrokzanan navê sumerî lê kirine. Sumerî gelekê gelek dahêner



bûye wan ji bo cara yekê di dîrokê de, nivîsîn dahênaye, dem hijmarîne, dolab çêkirîne,

Dolab ku ji darî hatiye çêkirin, bi yek ji mezintirînû giringtirîn dahênandi dîrokamirovatîyê de dihê hejmartin ji ber ku bi dahênana wê jiyana xelkî bi sanahîtir lê hat û mirovan erebane çêkirin ku bi rêka wan şîyan barên giran ji cihekî veguhêzin cihekê di.



Dîrokzan navê desxetê bizmarî li nivîsîniya sumerîyan kirine ji ber ku îşaretên wan wek formê bizmarên evro ye.



Peykerê (gudiya)î ku yek ji melikên sumeriyân bû.

ax bi rêka avdanê şîn kirîne, bajêr û peristgahên mezin bo xwedawend û bêlayên bilind bo melikên xwe ava kirîne, yasa danane û dest bi bazirganiyê kirîne. Bi kurtî hemû dîrokzan dibêjin: "Sumerî yekem gelê xwedan şaristanî bûye di dîroka mirovatiyê de". Ji bajêrên navdarên sumeriyân ku şîwarên wan hatine dîtin: Or, edîso, larsa, orok, nîpor, lagaş û kîş bûyine. Her li ser vê axê çendîn şaristaniyên di jî av bûyine wek şaristaniya aşûrî û babilîyan.



Hincar eve jî dahênaneka mezin bû ji bo zevî kêlanê.



Fuseyfsaeka giranbiha ku li bajêrê or hatî ye dîtin.